# MÛZÎKA KEVNEŞOPÎ YA KURDÎ Û HINEK TAYBETMENDIYÊN WÊ

A. Rahman Çadirci

Li Kurdistanê her çendê ku berê bi çeperên feodal, di roja me de jî bi sînorên mêtingerî dabeşbûn çêbûye jî, lê li rexmî cudabûnên di nav herêman de derketine holê, muzîk û çanda Kurdî bi yekpareyî herdem xwe daye jiyankirin. Ji ber ku gelê Kurd vêya pêk aniye, gelê Kurd di nav xwe de li mûzîka xwe xwedî derketiye û pêş xistiye. Mûzîka Kurdî di bingeha xwe de mûzîka gel e û "anonîm" e. Ji hêla naverok û şikil ve hişk û hişk bi jiyana Kurdan û karen wan ên rojane ve têkildar e. Çavkaniya xwe ku ji nav gel digire û mercên ku di nav de pêşketî, cûrbicûr in. Mûzîka Kurdî xwe dispêre stranên daraz û nirxên Kurdan, cîhana hestên gel û jiyana wan ya rojane dike mijara xwe û stranên epîk ên şeran, qehremantî û têkoşînên navxweyî.

Piştî ku stran cara pêşîn hate afirandin, hevaltiyek enstrumantal li ser tê zêdekirin û ji aliyê dengbêjan ve ji gundekî bo gundê din, ji mezrayekê bo mezrayeke din tên belavkirin û danasandin. Û bi vî awayî rewşa xwe ya anonîm digire.



Yên ku mûzîka Kurdî ya gelêrî pek tînin, dibin sê beş: Çîrokbêj, stranbêj û dengbêj (an jî aşiq-hozanên gel). Di nav Kurdan de bi piranî di meclîsên êvaran û şevan (civat û sohbetan ) de mûzîk dihat çêkirin, gotin û guhdarkirin. Ji vê rêbazê re şevbuhirk-şevbihêrk tê gotin.

Stîlên mûzîka kevneşopiya Kurd em dikarin wiha rêz bikin: 'Lawje, Heyranok, Pîre-payîzok, Lawikê Siwaran, Destan, Bêrîte/Belîte, Dîlok, Serşo, Narînk, Stranên Kar, Şeşbendî, Lorik, Stranên Merasiman, Katar, Medîha ve Mewlûd.'

Di pêvajoya herî geş ya di çanda Kurd de mûzîk, di avaniyeke kevneşopî de, hêj bêtir bi dinyayî, lê dîsan jî kêm an zêde weke mûzîka huner ku meyla wê ber bi awayên manzuma klasîk ve pêş ketiye. Li seranserê Kurdistanê, dixwazî li bajar, dixwazî li herêmên çolwar, mûzîka gel heyîna xwe dide berdewamkirin. Di navbera mûzîka bajêr û çolwar de bi awayeke giştî girêdaneke ji

nêzîk ve heye. Mûzîka kevneşopî-otantîk a Kurdî, bê ku ji bandorên biyaniyan ve bê xirabkirin, bi taybet li herêmên çolwar heyîna xwe daye berdewamkirin.

## Hinek Taybetmendiyên Wê

Di mûzîka otantîk a Kurdî de mûzîka bideng bi giranî ye. Weke mûzîka gelên dîtir ên Rojhilata Nêzîk, mûzîka Kurdî jî yek-dengî ye; stran bi xwe di bingeh de xwedî taybetmendiyeke vokal e. Enstrumanên bi dîmane (îzafî) di rolek duyem de ne. Bi enstrumanê re hevaltî kirin ji berê her tiştî ji bo guhdarvan bikeve rewşek giyanî ku hêj baştir bigihêje peyama vokalê, li ser deng tê zêdekirin. Heta li gorî hinekan melodî ji bo xizmeta bi bîranîna gotinên stranê ye. Her cûre têgînên ku muzîsyenekî pênase dike, stranbêj an jî muzîsyen, bi muzika deng re têkildar in: Dengbêj (yê bi deng dibêje, daxive), qawal (yê Erebî di axive) kilam-xwan (vebêj). Stranên Kurdî xwedî stîleke dengê diyar e. Her wiha ev stil xwedî baweşîneke deng a berfireh e. Weke din ev stîl gelek caran pêwîstî bi van tiştane dibîne: Dengekê mêranî û bi kirp (derbdan); di gotina stranên epîk de lezbûn û têkuzî; ji bo stranbêj di kategoriyên cuda de tûrikeke fireh a stranên kevneşopî.

Di mûzîka Kurdî ya kevneşopî de stran jin be, zilam be bi pir dengekî qurisî tê gotin. Tona deng jî bilind û di rewşek nayê guhertin de ye. Dengên tîz hîn bêhtir tên bijartin. Di vê muzîkê de di nav xwe de aliyên hevbeş wiha tên rêzki-rin: Newayên bergehek teng, neyîna elementên bi aheng û pirdengî, enstrumanên dixin navberê, girêdana bi soloyan re û pêkanîna koroyên biçuk.

Strana kevneşopî ya Kurdan sparteyî dubarekirina bendekê ye. Dema ji bendekî derbasî bendeke din dibe, tenê gotin diguherin. Hemû stran û lawik (serhewa) ji serî heta dawiyê bi heman ruhî berdewam dike. Pasajên sivik (bi-hereket) û coşdar ên ku herikîn an jî hewaya stranê qut bikin, nakevin navberê. Di vê yekê de, di destanan de îstisna hene. Ji bo her beşeke bi aksiyon a destanê qalibê newayek (melodiyek) û rîtmeke cihê hene.





Karakterê koçbertî di asteke girîng de bandor li mûzîka Kurdan kiriye. Di dema pîrozkirina derketina zozanan an jî daketina germiyanan, çêbûna berxikan û berxbirê (qusîna hiriyê) de stranên girêdayî demê berê, xwedî cihekî girîng in.

Mûzîka Kurdên ku bi çanda çiyan û bi çanda deştê ya dêmanî dijîn, cihê ye. Çendî li herêmên çiyayîn stranên ku bêhtir sert, kirpandinên wan xurt û enstrumanên fûyî (pifînî) li pêş bin jî, lê li nav Kurdên deştî îcar stranên ku bêhtir xwedî ruhekî aram û xwedî hej û amûrên jîdar in, hene.

Di muzîka Kurdî de hêjmara berhemên dansî/reqsî giraniyek cidî pêk tîne.

Her çiqas meqamên ku têne bikaranîn bi giştî rast, newrozî, kurdî, çargah, buselîk, hîcaz û hwd. bin jî, dikare bê gotin ku hemû meqamên li Rojhilata Navîn hene, têne bikaranîn.